

AGAHDARÎYÊN BINGEHÎN JI BO PENABERÊN
YEWANÎSTANÊ

HEVGIRTINA MALBATÊ YA DUBLÎN Û BREXIT



Refugee Legal Support is a restricted fund under the
auspices of Prism the Gift Fund - charity no 1099682

BREXIT ÇÎ YE?

Brexit behsa vê yekê dike ku Brîtanya ji 31ê Rêbendanê ya 2020-an de wê ji YE derbikeve.

GELO DÊ BREXIT BANDORÊ LI MIN BIKE?

Her çend Brîtanya ji Yekîtiya Ewropî di 31ê Rêbendê ya 2020an de derbikeve jî, heta 31ê Kanûnê ya 2020an dê «serdemek derbasbûnê» çêbibe. Ev tê wê wateyê ku heke we li Brîtanyayê endamên malbatê yên xwedan mafdar hebin, hûn dîsa jî dikarin ji 31ê Kanûna sala 2020an pê ve, serlêdana hevgirtina malbatê wekî normal bikin.

GELO EW RAST E KU SERLÊDANA HEVGIRTINA MALBATÊ YA DOBLIN PIŞTÎ 31Ê KANÛNA 2020AN TÊ GUHERTIN?

Na, "Pergala derbasbûnê" dikare were dirêj kirin. Lêbelê, serokwezîrê Brîtanya dibêje ku ew naxwaze wê dirêj bike. Ger ew bidawî bibe, divê biryarek berî 1ê Tîrmeha 2020an were girtin.

DÊ ÇI BIBE HEKE EZ PIŞTÎ KANÛNA 2020AN BIRYARA/BERSIVA HEVGIRTINA MALBATÊ BISTÎNIM?

Ger Yewnanîstan berî 31ê kanûna 2020an ji Brîtanya daxwazek şand ku Brîtanya berpirsariya doza we ya penaberîyê bigire, heman qanûnên serlêdana Dublînê derbas dibin, lê ger Brîtanya di nava 2 mehan de bersiv neda, ev nayê wê wateyê ku serlêdana we hatî qebûl Kirin. Heke hûn piştî 31ê Kanûna 2020-an bersivê nerênî werbigrin, ne garantî ye ku hûn ê bikaribin ji nû ve serlêdanê bi awayek normal bidin.

PIŞTÎ KANÛNA 2020AN DÊ ÇI BIBE?

Di vê demê de ne diyar e. Brîtanyayê derheqê penaberan û koçberên din ên ku malbatan tînin, qanûnên xwe hene, ji ber vê yekê dê rêyên din ên qanûnî jî hebin ku hûn bi malbatan re bêne cem hev. Wekî ku tişt zelal bibin em ê agahdarîyên bêtir belav bikin, ji ber vê yekê zanyarîyan li ser vê rûpelê piştrast bikin; www.refugeelegalsupport.org, û ji bo nûvekirina zanyarîyên xwe serdana Facebook-a me bikin.

EV AGAHDARÎ JI 1/2/2020 VE RAST IN, LÊ QANÛN BI BERDEWAMÎ DIGUHERIN. JI KEREMA XWE, JI BO AGAHDARÎYÊN NÛJEN SERDANA MALPERA ME BIKIN:

WWW.REFGEELEGALSUPPORT.ORG